


RAPORA DAWÎ Di pêvajoya Covid-19ê da li deverên cuda yên Stenbolê Lêkolîna zarokan a gihandina mafên xwe



Lênerîna Lêneran

1.91

Hejmara lênerên ku tevî xebatan
bûn û nêrînên xwe par vekirin
Tevde 269 kes
Hejmara zarokên ku rewşa
wan ji aliyê lêneran ve
hat hîn kirin **269**

JÎYAN, JÎYÎN Û GEŞEDAN

Êdî tiştêk nema ku bibêjim, ka çi bibêjim hevserê min naxebite, em gelek pirsgirêk jîyan
tew min wê rojê ji mamosteya kurê xwe ra got, min gelek şerm kir lê bawer bikin
tiştêk din ji destê min nedihat. Ez li meta xwe geriyam û min got di rewşeke gelek
xirab da me, îsal fitra xwe bide me, wê jî derxist 25 lîreyan da lê min dîsa jî girt, ka çi
bikim min got qet nebe dê bibe heqê nan, pir zor e.

Dêya du zarokan

100%ê lêneran anî ziman ku
serî li piştgirîyan dane lê negirtine,
100%ê wan ên ku piştgirîyê
girtine jî anî ziman ku pêdiviyên
wan didomin.

Dêya du zarokan

Me jî tu derekê alîkarî negirt.
Herî dawî jî muxtar ra qolî hatî,
min jê ra got rewşa me xirab e,
tenê jî wî qolîyek qût girt

Du odayên me hene lê paceya odayekê nîne,
ji bo ku hundir bê hewa nemîne em wê odayê
nagirin. Xwedê meke yek nexweş bikeve
em nikarin odayeka din peyda bikin.

Dêya çar zarokan

100%ê lêneran destnîşan
kirin ku Covid-19 erênî be,
di malê da bi halê heyî karantîna
nepêkan e.

Dêya du zarokan

Em dê hemû di odayekê da bijîn,
derfetên karantînayê ava bikin.



100%ê lêneran gotin ku berî Covid-19ê her
tim dahatê bi dest nexistin an jî di vê
pêvajoyê de ji karê xwe bûn.

Bavê sê zarokan

Di malê da kesek ku bixebite tune ye.
Me bi qûtên ku we şand debara xwe kir.
Ew jî xilas bûn.



Dêya sê zarokan

Me alîkarîya 1000 lîrayî girt lê qedîya,
bi vî awayî bi sê zarokan derfet nîne
ku kirêyê bidim û ji marketê tiştan
bikirim. Ku em nexebitin em dê biçin gundî.

GIHANDINA PERWERDEHÎYÊ YA ZAROKÊN WAN

100%ê lêneran gotin zarokên
wan qet yan jî her tim xwe
nedigihandin EBAYê



Di komên înternetê da spartekan didin zarokan lê ji bo ku van
spartekan çekin divê em weşanên wan bigirin.
Zarok nikarin li ser telefonê spartekên xwe çekin,
ev jî lêçûneke giran çêdike. Divîya min di nava hefteyekê da
100 TL bida, bixwedê êdî naçim ku weşanan bigirim.
Jixwe zarok jî li gotina min guhdar nakin, dest jî dersan berdan.

Dêya du zarokan

BIDESTXISTINA TENDURISTÎYÊ

100%ê lêneran ji bo
pêşî li ber Covid-19ê
bigrin tiştêk nakin.



Lê belê tiştê ku li zora min çû firotina maskeyan bû, him dibêjin bê maske
dernekevin him bi pere didin, wê rojê ez çûm marketê min negirtin hundir,
gelekî zora min çû. Niha, gava ku bi zarokên xwe ra derdikevim ez didim
ber devên wan lê bi xwe nikarim, na ew ê ew qasî maskeyan pê çî bikin,
di hilbijartinan da em dibînin ku çî qas pere didin kaxizan niha ji bo
maskeyek nikarin peyda bikin ez fem nakim.

Dêya sê zarokan

Dêya çar zarokan


Di destpêkê da me nedîte. Gava ku diçûm
tiştêk bistînim min bi çarîkê serçavê xwe dipêça.

BIDESTXISTINA AGAHÎ Û MEDYAYÊ

Zarok jî gelek aciz bûn, her tim jî televîzyonê xeberên
xemgîn dibihîsin. Dilê me jî nerehet e lewma em berên
xwe didin hev lê bi rastî ez nizamim di vê demê da
divê ez çawa nêzikî wan bibim. Kesek wisa ku dê û
bavan bida agahdarkirin dê baş bibûya.

Dêya du zarokan

100%ê lêneran bi taybet bi nûçeyên
televîzyonê û bi medyaya sereke xwe
digihiştin agahiyan.



Me nexwest ku înternet bi kar bihînin. Dema ku nexweşin,
vîrus hat zarok di malê da man. Qada mezin, baxçeyek nîne ku
zarok tê da bilîzin. Ji bo ku zarok aciz nebin me anî malê.
Mebesta me ew bû ku pevçûn, xirecir çênebe.
Bila vîrus xilas bibe ez dîsa naxwazim li malê înternet hebe.

Dêya sê zarokan


Di hevdîtina yekem da lênerên ku gotin xwe nagihînin
înternetê **100%**ê bû, di hevdîtina duyem da ev daket **100%**an.

100%

100%



Dane di gulana (çaryeka dawî) 2020an da ji hevpeyvînen telefonê ku tevayî bi 85 lêneran ra li navçeyên Stenbolê yên Fatîh-Karagumruk,
Fatîh-Çapa, Fatîh-Mevlanakapî, Fatîh-Fındıkzade, Ataşehir, Sancaktepe-Sarıgazi û Beyoğlu-Tarlabasıyê pêk anîn, hatin girtin



Ev weşan, bi Programa ABYê ya Etkinîzê, bi piştgirîya kare malî yê Yekîtîya Ewropayê hatiye çekirin.
Ji naveroka vê weşanê bi tenê Komeleya Piştewaniya Civaka Tarlabasıyê, Komeleya Dilxwazên Sulukuleyê,
Smal Project Istanbul û Weqfa Çand û Hunerê ya Başak berpirsiyar e û bi tu awayî nêrînên Yekîtîya Ewropayê nişan nade.